


Vexwendin ji bo civînê

Şemî, 20. SEBAT 2010
Karl-Rahner-Akademie
Jabachstr. 4-8 • 50676 Köln



Zentrum für Kurdische Studien e.V.
Navend ji bo Lêkolînên Kurdî
Center for Kurdish Studies
Centre des Etudes Kurdes
ناوهندی لیکۆڵینهوهی کوردی

Ji bo pêşerojê hevpar Rewşa rewenda Kurd û rêxistinên wan li Herema Nord Rhein Westfalen

Li Almaniya di demên dawîn de rêxistinên koçber ji aliyê raya giştî û aktorên siyasî ve balê dikêşînin ser xwe.

Rêxistinên rewendî gerek bi tevna xwe ya civakî, gerek bi ezmûna xwe, berjewendiyên civakên xwe tînin ziman û temsîla wan dikin. Herwiha di warê entegrasyonê de sahaya xebata xwe her diçe bi awayeke profesyonelîr berfireh dikin, ji bo endamên xwe xizmetguzariyên civakî û amojgarî pêş dixin. Herwiha ew êdî zêdetir wek nûnerên siyasî yê civaka xwe jî tevdigerin.

Rewşa Kurdan -ku ew li Almaniya yek ji komên rewenda herî mezin e-, ne di nîqaşên pirsjirêkên koçberan de û ne jî di xebatên entegrasyonê de têra xwe cîh nagire. Helbet gelek sedemên vê yeke hene. Lêbelê rastiyeke jî heye ku rêxistinên Kurd yê li Almaniya gerek ji ber struktûrên xwe, gerek jî ji ber xebatên xwe yê ku berê wê li welat e, heta niha di warê xizmetguzariya civaka Kurd ya li Almaniya

de têra xwe erkên xwe yê civakî bi cîh neanîne.

Herwiha wan, xebat û daxwazên civaka Kurd ya li Almaniya têra xwe li hember raya giştî ya vî welatî neanîne ziman. Ewçend jî di demên dawîn de di nav rewenda Kurd de, di derbarê kêmkurtiyên rêxistinên wan de nîqaşekî destpêkiriye.

Em jî dixwazin tevî nûnerê rêxistin, înisyatîf, komel, rêxistinên banî û şexsiyetên Kurd, rewşa jiyana rewenda Kurd li Almaniya û modela rêxistinbûnê ya ku karibe bersîva rewşa jiyana wan bide, binirxînin.

Herwiha em dixwazin di vî warî de hemû daxwazên Kurdan -li asta eyalet û federal- diyar bibin. Di vê derbarê de wê hizr û raman û fikrên cuda bibin esasê nîqaşeke kûr û berhemdar jî.

Em bi dilûcan we vedixwînin vê civînê. Beşdar, dikarin bi zimanê ku bixwazin, biaxifin.

Bername ya civînê:

10.00 Destpêk

10.45 Silavdan û axaftina vekirinê

Metin Incesu, Serokê NAVEND'ê

11.00 Rewşa rewenda Kurd û rêxistinên wan

Bi nîqaş û pêşkeşan analîza rewşê

13.30 Firavîn

14.30 Rola taybet yê rêxistinbûna rewendan

Pêşkeş

15.00 Rewşa komel û saziyên Kurd

15.15 Nêrînên saziyên Kurd

Danûstendin bi nûnerên rêxistin, komel û saziyên rewenda Kurd re

16.00 Perspektîfa rêxistinên Kurd û bendewariyên wan ji siyaseta (federal û heremî) Alman

Pêşkeşan

17.30 Nirxandina encaman

18.00 Dawiya civînê

Tika ye, divê herî dereng heta **18'ê Sebata 2010'** an bi rêya e-maîl an jî faxê forma serlêdanê li me bê vegerandin.

So erreicht man den Veranstaltungsort

Veranstaltungsort: Karl-Rahner-Akademie ▪ Jabachstr. 4-8 ▪ 50676 Köln
Fon 0221 - 80 10 78-0 ▪ Fax 0221 - 80 10 78-22

Anfahrt mit dem PKW:

Die Karl Rahner Akademie **liegt in der Stadtmitte** Nähe Neumarkt gegenüber den Kirchen:

- St. Cäcilia / Museum Schnütgen und
- St. Peter / Kunst-Station Sankt Peter / Köln

Fußweg:

- vom Neumarkt ca. 5 Minuten
- vom Dom / Hbf. ca. 20 Minuten

